

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK


kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Harok jekiyen malan e.





ŞÊX SAÎD PİRAN
1925

BÎRANÎNA ŞÊX SEÎD

Şêx Seîd, li bajarê Erzeromê, li qeza Xinis, gundê Kolhesarê hatiye dinê. Bavê wî Şêx Mehmud e. Ew bi xwe jî ji malbatek welatparîz bu. Şêx Seîd, di bin tesîra welatpariziya malbata xwe hê di xortaniya xwe de ji bo mafên netewa kurd ketê qada şer. Di sala 1922'an de, di bin serokatiya mîralay XALID BEGÊ CIBIRÎ de PARTIYA AZADIYA KURD saz bu. Daxwaza endamên partiyê ew bû ku Partiya Azadiya Kurd bikin rêxistinekê giştî li Kurdistanê û ji bo rizgariya Kurdistanê şer bikin. Şêx Seîd bi xwe jî endamê vê partiyê bû.

Pêştî ku Şêx Seîd bu endamê partiyê, ne di xwest di mala xwede rabiweste û îstirehet bike. Ji ber vê yekê, di roja 30.12.1924'an de ji Xinisê derket û çû Solxan, Darahênê, mintîqa Şûşarê û Çapaxçurê De geriya. Armanca wî, ji bo şerekî netewî, gelê Kurd hêşyar bike û hêzekê xurt pêk bîne. Rika gelê kurd li dijî

zordestê Tirk gelek bû û vê yekê jî karû barên Şêx Seîd hêsantir di kir. Bi vî awayî bi hezeran welatparêzên Kurd îltîhaqê hêzên Şêx Seîd kirin.

Haya zordes û kolonyalîstên Tirk ji vê xebata Şêx Seîd û gav bi gav li dû wî digeriyan, da ku wî bigrin û bi vî awayî pêşveçûna gelê Kurd rabiwstînin. 8'ê meha 2'an. 1925'an de, li Pîranê fermandarkî (qumandan) Tirk bi leşkerên xwe ve dora Şêx Seîd û hêzên wî girtin. Birayê Şêx Seîd, Şêx Evdîrehîm bêî destûra Şêx Seîd fermandarê Tirk û leşkerên wî kuşt. Şer ji nişka ve dest pê kir.

Di 14.2.1925'an de leşkerên Kurd, DARAHÊNÊ bi destên xwe xistin. 29.2.1925'an de ERXENÎ, MEHDEN û SÊWREKÊ girtin.

2.3.1925'an de leşkerên Kurd dora DIYARBEKÎRÊ digirin. MIHÊ HELÊ û 60 CENGAWERÊN Kurd di ser kela Diyarbekirê de di kevin nav bajêr. Lê ji ber kêmbûna hejmarên wan û zêde bûyina leşkerên dijmin, ew nikarin bajêr bigrin.

Şerê gelê Kurd, ji bo mafê netewî di demek kurt de li herderê Kurdistanê fireh di be. Ji Diyarbekirê heta Elezizê, Qerekosê, Erzeromê, Agirê, Bedlîsê û heta Mûşê ber fireh dibe. Fireh bûna şer hinek nexweşiyên jî bi xwe re tîne. Di nava hinek eşîrên Kurd de nakokî derkeve û ew di be sebeb, ku Kurd di hinek mintiqan de bi hev dikevin.

Hinek serek eşîr bi tirkên re li hevtên û li dijî Şêx Seîd û hêzên wî şer dikin.

Di 6.4.1925'an de Tirk dora darahênê digrin. Di 24.4.1925'an de Şêx Seîd, li deşta Mûşê li ser pira Mûradê şerekî pir giran dike. Di wî şerî de, hevalê Şêx Seîd, binbaşî (serleşker) Qasim (Qaso yê Cibirî) hevaltiya leşkerê Tirk dike û li gor planê Qaso, li ser pira ÇARBIXÛRÊ. Qaso bi destên xwe Şêx Seîd digre û teslîmê leşkerên dijmin dike.

Di roja 4.9.1925'an de li Diyarbe-

kirê, Şêx seîd, Dr. Fuad, Seid Evdilqadir,
Seyid Muhemed, Sadiyê Paloyê, Ebûqat Ke-
mal Feyzî yê Bedlîsî û 51 gernasên
Kurd hatin bi darvekirin.

Li ber dara sêdarê Şêx Seîd waha di
got: "Ez, diçim diyarê Şehîdên Kurdistanê,
GELÊ KURDISTANÊ, WÊ HER TOLA ME JI WE TIR
KAN BISTÎNE"!

Belê, Şêx Seîd Şehîd bû û ket nav kar-
wanê Şehîdên Kurdistanê. Lê, wê xwîna sor
a ku rîjîya li tewşê ne çû. Gelê Kurd, her
dem bi serfîrazî, bi hêz û şiyana xwe vê
şerê rizgariyê ajoti ye. Şer, tu caran ra-
newestayê û wê her berdewam be!.

Em, bawer in ku wê gelê Kurd xwîna Şe-
hîdên xwe yên Leheng li erdê nehêle û
welatê hwe rizgar bike.

Em, redaksiyon, emegdar û xwendekar ên
kulîlk'ê di 59 saliya Şehîd bûna Şêx Se-
îd bi bîr tînin û sond di xwin ku teko-
şîna Şehîdên Kurdistanê bajon serî heta
bi rizgariya KURDISTANÊ û azadiya gelê
Kurd!....

KURDISTAN

Kurdîstan, Kurdîstan niştimanî cuwan
Her bijî be şadî serbestî û azadî
Her bijî, her bijî, her bijî
Lûtkey berzî gerdin geşit
Nizarî spî ber xorî reşit
Dolî kîp û çemî xurt
Daristanî zebend û çirit
Beheştî ser zemînin
Hêlaney xwoşî jînin
Cêgay noşîn
Agir tîşkerî îlham û hoşin
Kurdîstan, Kurdîstan niştimanî cuwan
Her bijî be şadî serbestî û azadî
Her bijî, her bijî, her bijî

Ferhengok

Beheşt: Cenet	Lûtke : Serê çiyê
Berz : Bilind	Noş : Şeref
Cêga : Cîh, şûn	Zebend : Fireh
Dol : Newal	
Kip : Bê deng	

ZAROKNO!

Zarokên îro mezinên peşerojê nin
Divê hûn tolê ji dijmin hilînin,
Berî her tiştî divê hûn bixwînin
Ewe dermanê me Zarokên hêja

Dema hûn mezin bibin xwe ji bîr nekin
Ji bo welatê xwe tev xwe bi rê kin
Bibin Pêşmerge xwe bi çekan girêdin
Eve dîroka me Zarokên delal

Dêrsim û Koçgirê bînin bîra xwe
Bi hezaran gorî bûn ji Zarokên me
Hatin qelaştin zikên dayikên me
Wan ji bîr nekin Zarokên delal

Bi hezaran birayên we bi tawan
Hatin şewitandin li çol û çiyay
Ji ber navên wan Zarokên Kurdan
Xwe qenc binasin Zarokên delal...

Ez jî zarok bûm, kurdim wek we
Îro çek li mil bûme Pêşmerge
birîndar im yek ji birayên we
Hûn jî bimeşin Zarokên delal

1982
BIRÎNDAR



ÇÎROKA HOKO

Rojekê, di dema Bedirxan Begê mîrê Botan'da, gurekî ji çiyayê Kovitîne xwe berda ser Çiyayê Botan, kete nava pezê mîr û li çend mîha xist kuşt. Rojek du roj, sê roj, mehek her timî gur dikete nav pezê mîr, ku êdî tu kes nediwêribû here ber pezên mîr.

Ji tirsê gurê har, pezên mîr bê şivan mabû. Di mala mîr de, xulamêk wî hebû ku piçek dînik û aqil sivik bû. Navê wî Hoko bû, Hoko rabû çû ba mîr û got:
-Ez dixwazim bibim şivan.

Mîr, li Hoko mêzekir û got "Başê kurê min ji xwe ji te û pêve kes nemabû ku here ber pêz".

Hoko, ra bû daket xwarê deng li her dû seyên xwe kir û pez ji goman derxist û berê wan da çiyê. Demek derbas bû gurê har pejna pêz kir û bi erişek dijwar daket nav pêz. Hoko çewa dit ku gur hat zû deng li herdû seyên xwe (Beşo û Kero) kir.



Hoko û her du seyên xwe bi hev re da ketin şerê gur û gurê har li wê derê kuştin. Êvarê,pezên xwe da peşiya xwe û bi kêfaxwe hani malê.Mîr dît dit ku pez hat, ew jî daket xwarê û pez hejmart, lê tu kêmasî di pezda ne dît:Mîr got "Aferîn Hoko,pezê te temam e".Hoko tew li ruyê mîr mêze nekir û çu gomê li nav pez raza.

Tu nabê piştî ku Hoko tê malê,neçirvanekî tê ser laşe gur û bi çavên xwe di bî ne ku gurê har hatiye kuştin.Neçirvan rast berê xwe dide koşka mîr û diçe dîwana mîr.

Mîr,di dîwanê de rûniştandiyê dibîne ku waye mirovekî hate huzûrê.Mîr dibêje "Fermo kurê min te xêr e"?

Neçirvan got"Mîrê min",mîrgot:

-Lebê.

Neçirvan got:

-Lebê şêrîn,min îro gurê harê ku dikete nava pez kuşt!

Mîr got:

-Aferîn ji te re,ka bêje te çawa kuşt?

-Ez bi sariya sibê re derketim nêçirê,
hew carek min dît gurê har waye li wê
derê ye.Min hedîka tîr û kvanê xwe rast
kir û berdayê û gur ket xwarê,û min bi
kevir û kuçan wî tamam kir!.

Mîr li nêçirvan mêze kir û got"pixk"
nêçirvan ji tirsî veciniqî û bostek ji
erdê bilind bû.Mîr got:"De rabe virekê
pîs wele te nekuştiye.

Edi hetanî nivê şevê gelek kes hatin
ba mîr û gotin"gurê har min kuştiye".
Mîr,ji her kesî pirsî:Başe te çawa kuş-
tiye?"Her yekî gor aqilê xwe tişteket got.
Mîr,ew hîla ku li nêçirvan çê kiribu li
herkesî çê kir û ji hemiyan re jî got:
-Hûn derewan dîkin,we gur ne kuştiye.

Wezîrê mîr, radibe diçe ba Hoko û jê re
dibêje:

-Kuro Hoko.

-Hoo.

Wezîr dibêje:

-Kuro Hoko ma te gurê har kuştiye?

-Belê wele min kuşt,ma kê kuştiye.

-De başe, rabe here dîwana mîr,wê mîr

bêje "Hoko"tu bêje lebê ez benî mirêmin
tu nebêjî "Hoo"di dîwana mîr de gelekî
şerme.

Hoko got "başê"û çû dîwana mîr.Mîr deng
lê kir got:"Hoko".Hoko got:

-Hoo.

Mîr got:

-Hoko,lawo qey te gurê har kuştiye?.

-Erê ,min kuştiye.Ma kî wê bukjê?.

-Kuro lawo,te çawa kuşt,ka bêje bo min?.

Mîr û her du wezîrên xwe gelek meraq di-
kirin,ku Hoko çawa gurê har kuştiye.

Hoko got:

-Weke ku ew wezîr seyê minî beşo be,we-
zîrê dî jî seyê minî kero be,ez jî ez im
û tu jî gurê har î.Beşo ji virde,kero ji
wirde û min jî ji peşiyêde bi darê xwe
li qafê te da û kuşt.

Hê peyva Hoko di devê Hoko de ye mîr ji
nîşkeve de got "Pixk"!Hoko got:

-Pixk û ...ê diya te.

Mîr,keniya û got:"Lawo wele te gor kuşti
ye aferîn ji te re"....

Hesenê Şûrê



M I J Û L Î

Sibeha zû Radibe



Gelo kî ye yê ku sibê zu radibe ?

Pêşî çêke di dû re reng bike.

PÊ KENÎN

Hevale kî min hebû, hîn nuh dest bi dibistana tirkî kiribû û digot "EZ, pir tiştan hîn bûme û başbi tirkî dizanim".

Rojek, diyamin pê henek kir û got "

-We çaxê gerek tu zanibî, teriya (duvê) kerê bi tirkî çiye ?.

Lê hevalê min navê teriya kerê bi tirkî nizanibû û got:

-Xaltîkê, hîna em negihane wê dersê.

ŞIVAN

Rojek mîha şivanek hunda dibe, şivan digere nagere mîha xwe nabîne deng li şivanê cîranê xwe dike:

-Lo-loooo, pezek min wenda buye ma te nedîtiyeee looo?.

Şivanê dî bersiv dide û dibêje:

-Niçç.

KUR Û BAV

Merivek hebu bê ewled-tewled
Wî nehêştibûn ne hec û ne ziyaret
Wî salê dida heya sed qurban
Sal dowanzde meh li serê rê-dirban
Axîna wî bû zarokek kurîn
Û bedena wî ne dibû hêşîn
Rebê keremê ,Xwedê fenaye
Rojekê jî ewladek dayê
Derbaz bûn meh û derbaz bûn sal
Û ew gede bû xortekî tîtal
Hat wextê wî zewaca dinê
Bavê,wî zewicand bi adetên dinê
Kur bu xwdî kozî û kulfet
Û jina wî jî zehf xerab derket
Bav êdî kor bû û ji ya xwe ket
Lê sist bûn qudûm,biriya hereket
Hêsîrî ket ber dest û mestan
Baharê koç kir û hat vivistan
Rojekî bûk ji mêr re dibêje:
-Bavê xwe bibe mêşe,bavêje.
Û îlaca kur êdî tê birîn..
Dilê wî kurîtiyê dibe derd-birîn
Û ew kurê dil bi kevir
Ji kirina xwe qet şerm nekir

Hanî bav kire sepetê
Rabû û da serê rê.
 Ew kurê pîs, ne merî
 Bav bir nav mêşê terî
Sepet ji ser mil hanî xwar
Û waha gote bavê jar:
 -tê bimînî li vira
 Û bibî xurê gura...
Bav got: "bibe sepetê,
Rojekî jî bi kêrî te tê,
 Wê te têxin sepetê,
 berê te bidin xurbetê....
Min maye tevr û bêrek,
Nahemlîne min yêrek...
 Kê tîne serê kesa,
 Tê serê pisê-pisa"...
Kur şerm kir ji kirina decal,
Bav hilda û hanî mal...

XELÎL'ê ÇAÇAN MÛRADOV
1971

KULÎLK'A KURDÎ

Kulîlka baxçê evînê
Li ber dilan şêrînê
Hewesa zarokan tînê

Kulîlka Kurdistanî
Di nav merg û bostanî
Renge-rengî, naz û cuwanî

Kulîlka baxê buharê
Xemilî bi dirûvê darê
Mîsalê cejna Avdarê!
Kulîlka sor û zer û rengî
Spî û gewher û şengi!
Di dilê zarokan de pengî

Kilîta dilê zarokên Kurdî
Ziman şêrîn û rindî
Di tariyê de wek çira û findî
Kulîlka bi hilm û bîn î
Awaz xweş û şêrîn î
Tu, bo zarokan her heşin î

A.Othmann
Almanya Rojava
1984

HECÎ GUR

Rojekê gur pir biçî bû bû, li çol û çiyana pir geriya lê tu nêçîr nekir. Pir fi kirî, dawî biryara xwe da û got: "Ger ez bi fenan nêçîra xwe nekim ezê ji birçîna bimrim, heyfa min!".

Cur, rabû şaşikek li serê xwe pêça û berê xwe da beriyê (Deşt) û çû nav gundan û dewarên pir.

Gur, pir çû hindik çû, li beriyê li nava erdekê pêrgî (laçî) mîhekê bû, dema mîhê ew dît ji tirsarê ra bû û bazda. Gur deng li mîhê kir û got: "Erê, erê ez hecî gur li ser rêya hecê, tebayekî dil paqij, û ev mîha hanê ji ber min direve û min dike dujmin (neyar), ji heciyek wek min dilovan ditirse, heyf û heyf.

Dema mîhê ev gotin bihîstin, rawestiya û hate cem gur û got:

-Bibûre apê Hecî gur, min ne dizanî tuyê biçî hecê, de ji kerema xwe re divla (ciyê) min jî kevîrê hecê maçî ke, û oxira teya xêrê be, tu bi xêr herî û bi xêr werî,,



Gur xatir jê xwest û çû.

Pir çû hindik çû ,pêrgî kerekî(Godirêj)
bû.Dema kerî çav berda gur,da zîtika û
lotika,kire zire zir û reviya.

Gur deng lê kir:"Erê,erê,Ez hecî gur,li
ser rêya hecê,tobekarê berdestê Xwedê,û
vî kerî ji ber heciyekî wek min dilovan
direve,çi heyf!!

Ker nêzîkê gur bû û got:

-Ma tuwê biçî ku apê gur?

Gur lê vegerand û got:

-Min li ber destê Xwedêtobe kir,ku
êdî ez ne ma lawuran bikujim.Ji bo ku
gunehên xwe ji stû yê xwe derxim,ezê bi
çim hecê û dev ji her tiştî berdim.

-Xwedê xêra te qebûl bike,oxira te ya
xêrê be,ji dêvla min ve jî kevirê hecê
maçî bike û silavan li heciyan bike.

Gur da rê û meşiya,piştê qederekî dî gi
hişte hêstirekî, hêstir hinekî ji gur
veciniqî.

Gur bang kir:

_Erê.. erê... Ez hecî gur, tobedarê ber
destê Xwedê, li ser rîya tewafa hecê û

ev hêstira xweşik ji hecî yekî weke min
vediciniqe.

Hêstir bang gur: kir:

_Tû yê bi kude biçî mamê gur? Çiye ev
şaşika li serê te, tu li ser rîya xêrê-
înşallah?

Gur lê vegerand:

_Tew... tew... Welle min li ber destê
Xwedê tobe kirî ye, ezê biçim hecê da
kû gunehên xwe dawşînim, ê dî ezê li
mala xwe rûnim û li ser rêça heqîyê
li ser rîya dînê îslamê bimeşim.

Hêstirê got:

-De gelek silavan li hevalên dînê îsla-
mê bike, Xwedê xêra te qebûl bike û o-
xir a te a xêrê be.

Gur meşîya, paşê fikirî û got:

-Heweh kuro....Ez çi ehmeqim, wextî ji
birçîna bimrim lê radibim berê xwe di-
dim hec a bi derewa. Ma bavê min çûye
hecê ,ma kalkê min bûye hecî ta kû ez
biçim. Bi xwedê ya baş ez vegerim û
wan teva bixwum.

Gur rabû li wan vegerîya, gihîşte mîhe.

Mîhê got:

-Te xêr e mamê gur, qey te tiştekan ji bîr kiriye ?

Gur got:

-Wele min ji bîr kiribû, min dixwest bi xwe ra ji bo te çend diyarîyan bînim lê mixabin ez temenê -êmrê- te nizamim, de ka were temenê xwe ji min ra bêje.

Dema mîhê xwe nêzîkî gur kir û kir kû diranên xwe şanî gur bike da kû bizanibin çend salîye. Hema gur xwe çeng kirê û ew kuşt. Ji goştê wê têr xwar û çû cem kerê. Kerê bang kir:

-Tu çi zû ji hecê vegehiyaye mamê gur?

Gur got:

-Wele min tiştekan ji bîr kiribû, de ka temenê xwe ji min ra bêje da kû ez ji te ra diyarîyekê bînim.

Ker hat cem û diranên xwe qîç kir û got:

-Mamê gur, de diranên min bihejmêre, tû yê bizanibî ez çend salîme.

Gur hema xwe çeng kirê û ker jî kuşt, ji goştê wî jî têr xwar. Berê xwe da cem hêstirê. Hêstirê famkir kû gur tiştina bike



Gur got:

- Wele min tiştêk ji bîr kiri bû. Min dixwest ji te re çend diyariyan ji hecê bînim, lê mi-xabin min temenê te nizanî bû. Ji ber vê yekê ez vegeriyam, dê ka temenê xwe ji min re bêje, da ku li gor wê ez diyariyan bînim!

Hêstirê lê vegerand:

- Wele, çaxa ez hatime dinê, diya min sala bû-na min li bin lingê min nivîsandiye, de ji ke-remaxwe were bixwîne, da ku tu bizanîbî.

Gur çu ku nivîsandina bin lingê hêstirê bixwîne, hema hêstirê heta jê hat pêhnek li ser çavê gur xist û ew bê hêş kir. Ew avêt ser pişta xwe û bir nava gund berda.

Çaxa kuçik (seg) ên gund çav li gur kirin, teva dan pêy û li nava gund birin û anîn.

Hecî gur, bi halekî nîv saxî xwe ji nav lepên kuçikan xelas kir û çu warê xwe. Xwarina wî jî, heca wî jî lê heram bû.

Dawî fikirî û got:

- De bixwe îcar, ma bavê min xwendibû ma kalê-min xwendibû, da ku ez rabim nivîsandina li bin lingê hêstirê bixwînim. Tobe li min û bavê min, ku ez carekê di bibim hecî û bixwînim. Tobe!...

GOTINEN BERÊ (yên bav û kalan)

Qisa ba û kadînê

Rojekê ka ji kadînê re dibêje:

-Xwuşkê, tu derê xwe veke, ezê kayê
bînim-têkim ser kaya te

Kadîn lê vedigerîne, di bêje:

-Na Heyran, tu kaya min nebe, ya te
ne lazimê min e!

Têmûrê Xelîl Mûradov

Rewan

XWARIN XWEŞE KIRIN REŞE

Delo ji kurê xwe re got:

-Temo lawo, iro emê herin kêlendiyê
bikşînin.

Kurî gote bavê xwe:

-Keko, piştta min dêşe, qet halê min nîne

Delo got:

-Temo, were em xwarinê bixwin

Temo got:

-Kanê kevçiyê minî mezin?.

BERSIVA MAMIKÊN HEJMARA 12'an:

- 1- Hêk
- 2- Genek (Gene)
- 3- Kuşxane (Beroş)
- 4- Hinar
- 5- Teşî
- 6- Kizvan
- 7- Ker û Hêstir

M A M I K

- 1- Ji vir heta Bexda,
kulaf rada.
Gelo ev çi ye ? (.....)
- 2- Kûmê Kûto tijî nûto.
Gelo ev çi ye ? (.....)
- 3- Li tehtê didim naşkê
Li avê didim dişkê.
Gelo ev çi ye ? (.....)
- 4- Ga yê sor alêse ga yê reş.
Gelo ev çi ye ? (.....)

XACE PIRS

	1	2	3	4	5	6
1						
2					■	
3				■		
4					■	
5		■	■			
6	■					

Çepera t:1-21 Avdarê,cejna netewî ya
Gelê Kurd û serê sala nu ya Gelên
Îranê.2-Îşareta cejna 21 Avdarê.

3-Term,meyt cesed.Li hinek deverên
Kurdistanê ji ard(Arvan)re tê gotin
û li hinek deveran jî,ji agir re tê
gotin.4-Di edebiyat û sitranên kurdî
de,ji keç û jinên cuwan,delal û xweşik
re tê gotin(berbi paş).5-Şên, çêkirî,
gundê şên.6-Ji tevahiya xwarina bê av
re tê gotin,weksavar,birinc,gerik (si-
mêdî)û keşkê.

Serejêr:1-Bi kurdî navekî keçan.2-Sebeb.3-Di zareva soranî de hevok(ke-
lîme).4-Gotinekê kurdi yê pêşiya he-
ye,ku di bêjin:Xesiyê ne dîn e ne îm-
an e.Bûkê ne ... e,ne ziman e.5-Tiş-
tekê vexwarine(berepaş).6-Serdest,keç
xwar,xwînmij.

BERSIVA XACEPIRSA HEJMARA 12'an

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	K	O	L	K	O		D	Ê
2	U	S	O		B	E	R	
3	L	A		Ê		D	Ê	R
4	Î	N	A	W	R	E	M	
5	L		V		O	G		A
6	K			Î			Ê	L
7		N	E	W	R	O	Z	

NAVEROK

	<u>rûpel</u>
Zarok fêkiyên malan e.....	1
Bîranîna Şêx Seîd.....	2
Kurdîstan (helbest).....	7
Ferhengok	7
Zarokno (helbest).....	8
Çîroka Hoko	10
Mijûlî	16
Pê kenînk.....	17
Kur û bav(helbest).....	18
Kulîlka Kurdî(helbest).....	20
Hecî gur.....	21
Gotinên bav û kalan.....	28
Mamik	29
Xaçe pîrs.....	30

0

www.arsivakurdi.org

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

PRIS : 10:- skr

BIHA